

## yekbûna Rêz û Aligrên Kurd serkeftine



### Yekbûn

Rewş û barûdoxê rojava yê kurdistanê îro roj pêwîstî yekbûnê ye , paşî têkçûna serxan û jêrxana jîn û jiyara civakî û komelayetî li ser hemû astan , çî ewlekarî û çî abûrî û pêkvejiyanî, lewra yekbûn pêwîstî mukum kirina dakokiyane û ladana nakokiyane, dêmekî hemû layen û aligrên siyasî berpîrsin ko nakokiyên bidin alî û dakokiyên biçespînin da ko yekbûn serdest û serbest be. Tevgera rizgarîxwaz li rojava yê kurdistanê li himberî hevsengî û hêlingandineke sitratîciye , ew jî parastina yekbûna civakî û yekîtiya netewîye, da ko kurd û kurdistan bi ser xwe ve bên û hêvî û armanç pêkve bên û wisa aramî û tenahî û yekrêzî şivan û serdar bin.

Dengê kurd

2



**Ji Diyok ta Barzanî Kurdistan Di mîne Dergûşa şaristaniyê**

3



**Xwendevan û Ciwanên Kurd Xetîra Serkeftinê ne**

3



**ARola Jina Koçer Di Civaka Kurdîda**

4



**Di navbera Kar û çalakiyên Yekîtiya Xwendevanan**

# Ji diyok ta barzanî Kurdistan di mîne dergûşa şaristaniyê

**mihemed emîn ere**  
<hemresh5@hotmail.com>



**T**im û tim ev rewşa xirab û bêhêvî, di hiş û ramanên mede dijî, gelo kurdan çi kiriye ta ev were serê wan ?.

kurdistan me xweşikê, rinde, rengîne, bedewe, bo çi ev tê sere wê ? Ev girûpên tundrew çi dikin li warê bav û bapîrên me, gelo raste eve nervîna me weke hawilatî kurd, û weke welat Kurdistan? em bibin qurbanîyên dîrokê weke her car ? kurdan pêxember dane mîna zeradeşt, û bi sedan zane, û zaniyarên ser astê cihanî pêşkêş kirine. şahinşahiyan kurdan nimûne bûn di şaristaniyê, û avahiye de, mîna gutî, lolo, xaldî, sobarî, mîtanî, mîdî, û sasaniyan, ev tev nimûne bûn di avakirina bingîha huner, ol, zanistî, karsazî, û çandiniyê de di rojhilata navîn de. Kurdistan herdem çavganîya dan û bexşînê bû, her û her mîletên rojhilata navîn fêrî zanistî, û zanyariyê di kirin, kesê dîrokê bixwîne wê bizani be ku me kurda tu carî qada xelkê dagîrnegiriye, em ne şer xwazin, em li ser hemû rûpelên dîrokê, aşti xwazin, em ne hov û hiriçin, lê em nikarin azadiya xwe têxin bin lingê xelkê, orkêş payîtexta mirovatiyê bû, lingên xwe xistin dîroka demê de, weke lingerê geşteke herî mezin di derya spî de, û bûne nimûne di cihanê de. midîya bi zend û bendên kesên xwe hat avakirin, û bavê giyanî ji vê şahinşahî yê re DIYOK bû, ew kesê ku mîlet, êl, û eşîrên kurdan kirin yek, bû damazrênerê şahinşahiyeke herî mezin di wê herêmê de, ya ku ji bin sitem û zordariya aşûriyan qurtal kir, ta radeyekê ku neviyên wî, şahinşahiya aşûrî bi yek car rûxandin, û hate şikandin, ev dîroka kevnar naçe ji bîra me, û di dema nûjen de tu car û tu carî em serok û rêberên xwe ji bir nakin mîna ube, idil ellahê nehrî, şêx se, id, ihsan nûrî paşa, malbata bedirxaniyan, qazî mihemed, şêx mehmûdê hefid, ebid elrehman qasimlo, û bavê giyanê

netewa kurd BERZANIYê nemir, yê ku tu car naçe ji bîra me, çimkî em dikarin hevsiyîyê bixin dinav bera herdû serokan de diyok û berzanî, gelek xalên hevbeş di nav bera wan de hene, û gelek rehendên siyasî ji hevbeşin :

1- diyok bavê giyanî bû ji mîletê kurd re di wê serdemê de, niha berzanî bavê giyanîyê ji mîletê kurd re divê demê de.  
2- pir bûna êl, û eşîrên kurdan li wê demê, û pir bûna nakokîyan di nav bera wan de, û li vê demê ji ev nakokî hîn hene, û biser de pir bûna partî, û hêzên siyasî.

3- Kurdistan dagîrkirî bû wê demê, û divê demê de ji, lê niha dagîrger bêtirin, û bihêztirin.

4- hebûna serokekî dîrokî, DIYOK di wê serdemê de, û BERZANÎ di vê serdemê de.

5- belavbûna cih, war, û welatê kurdan dinav bera dijminan de di herdû serdemên dîrokê de

6- pêşbînî di nerîna herdû serokan de, bo avakirina kurdistanê ser bixwe, û şaristanî ji hemû aliyan ve, zanistî, karsazî, perwerde, fêrbûn, û di hemû aliyan de.

7- kurdistan di wê demê de, û divê demê de her dimîne dergûşa şaristanî, mirovatî, û zanistiyê.

Û bi sedan xalên hevbeş hene em di virde li ser nasekinin, lê ya herî giring bo me evin

1- Kurdistan dergûşa şaristaniyê ye.

2- kurd mîletekî aşti xwazin, ne mîletekî tundrewê yan paşmayî ye.

3- em xudan keltûr, û kelpûrin, û em mîletekî zengînînin çî ji aliyê hişên zane ve, û çî ji aliyê qadê ve qada me gelek zengîne.

4- hebûna serokekî zane ku kari be vê zengîniyê bêxe di xizmeta avagirina welat, û mîletê xwe de. Bê goman ku ev herdû qonax dîrokîne, çimkî ev destpêka avakirina welatekiye, welatekî ku ev



bi sedê salaye kar û xebatê dike da mafê xwe yê rewa qizinc bike, û bizava rizgarî xwaz ew ji divê demê de gihiştîye astekî ku dikare livlivîna siyasî bike, bo mafê mîletê xwe care ser bike û dikare ji şaşiyên berê sûd werbigre.

Û ya herî giring hebûna serokekî dikare xelk û mîletê kurd li dora xwe dorpeç bike, û raya giştî ya cihanî dikare bandore xwe lê bike, ji ber cihê wî dinav mîletê wî de, û dinav dewletên herêmî de, û dinav dewletên cihanî de, lê ya herî giring ev nimûne ya diyar li pêş çavên dewletên cihanî, başûrê kurdistanê, ya ku bû nimûne di cihanê de bi avakirina xwe ya siyasî, zanistî, çandî, karsazî, çandinî, civakî, û rêvebirî, û bûye kevalek di herêma xwede de, û dicihanê de bi serkevtina xwe, û pêşketina xwe.

Ev yek tirseke dijwar dixê dilê dijminê mîletê kurd de, li van parçên din yê bin dest, yê ku dixwazin mîletê kurd bi perçiqênin, û bi hemû hêza xwe dixwazin bandorê li boçona giştî bikin ta kurd ne gihin mafê xwe yê rewa, û

xuristî, lê penda kurdî di bêje ( war ew ware lê bihar ne ew bihare ), kurd bi siyaseta xwe, û dûrbîniya xwe gelek pêşde çûne, û nemane tenê girêdayî bi siyaseta herêmî ve, lê bandore xwe li siyaseta cihanî jî dikin.

Îro mîletê kurd zana tire, hokerê navdewletî bêtir li aliyê kurdaye, lê ya herî giring hebûna malbateke dîrokî, mêjoyî xudan rêbazeke dîrokî, rêbaza berzaniyê, biseroktiya serok mesûd barzanî, û bi piştgêriya damazrênerê aborî û deraviya kurdistanê serok wezîr neçîrvan barzanî, yê ku buye nimûne di herêmê de, û dicihanê de, bi pêşbîniya aborî, îro kurdan xistiye warekî de ku kes nikare bi ser mede were, Û PERENSÎPÊN AVAKIRINA DEWLETEKE SERBIXWE JIMERE AVA DIKE, careke di ez dibê jim çawe diyok bû damazrênerê şahinşahiya mîdî di serdema kevnar de, bihêza yezdanê mezin serok mesûd barzanî wê bi be damazrênerê kurdistanê di serdema nûjen de, û Kurdistan wê bi mîne dergûşa şaristaniyê.

# ARola Jina Koçer Di Cîvaka Kurdîda



İsa mîranî

Jin evhebûnanazik ûdelal. spehîtirînberhemêzedanêpak, evmîrovadêrînyaxwe li sermîrovayetiye damezirandîye û piyexwebihêz li serxakacihanêdanî, ne bitenê jibo anîna zarok û kêfxweşiyazilameyan bêkirin û firotin bierzani, Di civakakoçeriyêdaxwedanarolekbandor û serekiye û cihêrêz û rûmetektaybet û xudanabiryarek azade jiberbeşdariyawêyarast bi malxwyemalêra di hemî karênpeê diviyên malbatê. Barkirin ûdanîn û karêrojane ye koçeran bûn yekjiegerênser-ekîjibejdarbûnainê di qadakar û xebatacivakîda û bimêrxasiboendezyaran nexşepaşerojêyemalbatê Bitîrêjênrojêradest bi karêxwe dike naxasimkarê girêdayî bi xwedîkirna pez û sewalan wek bêrî û dotin û cêkirnahemîberhemê

şîrwek penîr û mast û nîvişk û dewû şîjik û jaji û mējandinakar û berxênmējok-mijoldibê û demêbarkirinêarikariyamêr û zilamadikêdi vedana kon û wardoziyê da û bivîkarêgiranvaxwedîkirin ûperwerdekirnazarokêxweji bîrnakewan fêrî mērxasyû rēz û tore yê kurdî dike û keçênxwehînikarêdestyêkeltorîdike. Rêvebryamalêyanavxweyî bi awakîdîmokratîtehelbijartin û navêwêkevanîyamalêyêjibermalêkoçeragelekjintêdahenewek diş û xesû û jintî. û birazo bi zocidane dibûn, kevanîyamalêxudanabiryarên navmalê ye wek hişyarbûn û xwarin û kel û pel ûbelakirnakarêmalê li hemijinên malbatê. Jinakoçer di nedyarbûnamêrêxweda pêşwazîyamêvanan dike û xweştirinxwarnamalêpeşkeşîwa dike û dikoçerîyê dacihektaybetbijinatuneye têkilî bi mēra dike le kesayeti-yaxwejibîrnake . Mêrêkoçerev rûmet da jinêjiboewjikesayetiyaaxwenasbike û bibêhimekjiavakirnacivakê. Gavajî-nakoçerserkeftî û xudanakesayetiyekebîhêzbanavêwê dibû paşnavjîkurêwêraweknişanekrêzgirînişîkesayetiya wêra û gelekmalbatjîlakoçerêmîran binavêjînan hatinnavkirinwek mala bêgîye (wareserîya) mala berfo (berkelaya) mala xoxê(elyoka) mala narîne



(pisaxa) û berdanajinan linavkoçeran şerm û gelekême her wesa cidabûnjîgelekême, û mêrêkoçertucaran keçaxwe bi zorênademêrû her demdihêlêrêkirinjalyewêvabê û jîna-koçerxudanmexsewedînavmalê da û berhemêmxesewawêtêberdestêwê.

Gorîvêgeryanêliserrolajînakurdaya-koçerem di bininevjînhevala mēre di xweşî û ne xweşîyê da di barkirin û danîneîda û beşdaryê di hemîkarêmalbatî da dike û cihêxwebilind li navcivakê da di girê û xwe dike xwdana rēz û rûmet û biryarê.

## Xwendevan û ciwanên kurd xetîra serkeftinê ne



Bilind mela – Dêrik

E\_bilind@nefel.com

Lî jêr kewdan û baredûxên tengeví yên sûrî tēde derbasdibê bi giştî û rojavayê kurdistanê bi taybetî ji şoreşeka ta niha berde-wame ya ku bangewaziyî dikê ji bo azadiyê û serbestiyê .Di vî warî de rola genc û xwendevanên kurd li rojava diyar û eşkere bû ku ev texe bû pêşeng

û ardûyê şoreşê, li vê derê gotina Barzaniyê nemir tē ziman ( xwendevan serê rimê ne di hemî şoreş û serhildanan de ). Ê ewin helgirê xetîra serkeftinê ne û navenda tevgera rêzgarîxwaza kurdî ne. Encama vê yekê xwendevan û ciwanên rojavayê kurdistanê dîtin ku erk û berpirsiyatiya wan yekîtiyek damezrînin, ji ber ku ev texe pêşberkê hemî hevrêz û rêxistina ne û serkirdayetiya cemawer dikin di xwepêşandanan de . Lê di serhindêre bê çar man ne karîna berde-wamî bikin bi sedema zordariya rijêma sûrî û gelek kewdanên civakî. Pêngava zîrîni di dîroka rojavayê kurdistanê de berî çend rojan xwendevan û ciwanên kurd li rojavayê kurdistanê yekîtiyek damezrandin li Hewlêrê navenda biryara netewî a kurdî, rekeftî 7/9 /2013z li jêr diruşma ( Bi zanyarî û kar nefşek azad û ayîndeyek geş ).

Ev yekîti hate damezrandin ji bo alikariya armanc û hêviyên xwendevan û ciwanan ,û ji bo pêkanîna dezgehek xwendekarî û lawanî û karbikê bi şeweyek sivil û aştiyane û berevaniya vî texî ji metirsiya bira kujî û şerê navxweyî .Ev yekîti hate damezrandin ji bo rêzlênana van xwendevan û gencan yên ku binyata miletê me ne , û ji ber giringatiya wan û bere-

vaniya wan ji hemî metirsiyan. Yekîtiya xwendevan û ciwanên dîmokartî kurdistanî biryar dan di kongirê damezrandinê de hemî daxwaz û omîdên xwendevan û gencan bi pêkbînin da ku bikarin jîyanek xweş borînin. Ev yekîti pêngavek dîrokîye di pêvajûya tevgera rêzgarîxwaza rojavayê kurdistanê ji ber ti rêxistin berî wê nehatine çêkirin ku di bin baskê wê de giropek mezin ji keç û xortan kardikê ji Dêrikê ta Efrînê û gelek deverên di yên ku kurd tēde dijîn mina Heleb û Şam.

Ev damezrandina he encamek siruştîye ji rewşek saxlem da ku çemsariya gencên netewî yên xebatkar û xwendevanên ku hêvî omîda wan rahatîna araz-ûyan bi rengê dirust.

Encama vê yekê, yekîti gazi û bang dikê ji bo:

- Wan kesan yên bawerîni bi rêbaza kurdayetiye rêbaza Barzaniyê nemir da ku tevli vê yekîtiyê bin.
- Xemxûr û xwedan xîretên li ser doza kurdî.
- jin yên ji bo mafê xwe yê rewa xebatbike.
- Wan kesan yên bawerîni wan di pêdvîya mayin û xweragir li ser xaka rojavayê kurdistanê heye.
- Wi kesî yê daxwaza xebat û têkuşerê di ke.

# ALBOMA DUYEM YA JAN ARSLAN 'XEWREVÎN' DERDIKEVE!

Elî Reşîd

Jan Arslan kubialbomaxwe ya yekem "Evînperwer" jialiyê hezkiriyên mûzîkê û rexnegirên mûzîkê ve hatibû ecibandin, albu omawxwe ya duyemjî temam kir. Hilberînerê albomakubînavê "Xewrevîn" derdikevê Ayhan Evcî ye, albom biperkalêtomarkirîne digihêje guhdar û hezkirên mûzîkê. Di ev albomakuji 10 stranên pêktê bestekarîya Jan Arslan derdikeveholê. Gotinên 8 stranên vî albomê jialiyê Jan Arslan ve hatin nivîsandin, bestekarê 9 stranên albomê jî Jan Arslan e. Wekî albomaxwe ya yekem divê albomê de jî Jan Arslan cih daye gotinên helbestvanên girîngiyên zimanên kurdî, wekî helbesta Kamîran Ali Bedîrxan ya binavê "Kulîlkên Ezeb" û ya helbesta binavê "Janya" ya Rênas Jîyan. Di albomê de tenê besteyek jialiyê Jan Arslan ve nehatî ye çêkirin, ew jî "Li Vî Bajarî" ye kumuzîkavê stranê jî stranê gelêrî ya îngilîz "Greensleeves" hatî ye girtin û Jan Arslan gotinên stranên nivîsandî ye. Ev stran jialiyê gelek hunermendên binav û dengî hatî ye stîrîn. Divê albomakubîşewaza (Pop-Rock) hatî ye amadekirin û bipirani melodiyan akustîk hatine bikaranîn şîrovekirinê kebîhêz û gotinên stranabaldîkîşîne ser xwe. Di albomê de bigiranî bikaranîn amîjarên melodîk, deng û hestekgermderdixîneholê. Stranên albomê carnaguhdaran dîke navhesteka evîneka-mîstîk, carnakenê zarokê dînav şer de û carnaji dibe kevîya qêrî namirîne. Hemû qeydên albomê li Hamburgê çêbûne û derhênerî û sazîkirina albomê jialiyê Ayhan Evcî hatî ye çêkirin. Divê albomê de gitarê gitarîstên li Almanyayê vandemêndawî binav û deng e, Jonathan Warner lîxîst. Muzîsyenên bin av û dengyên wekî Chris Control, Martin Drees, Chris Harms, Tobias Heinshon, Gerrit Heineman, Wolfgang Meyer zu Eisen û Leandro Saint-Hill jî kedên xwepîştî girîng dan albomê. Lidu albomaxwe ya "Evînperwer" kujialiyê çapameniyê ve ala qeykmezîndîtibû û jialiyê hin malperên internetê wekî albomaherî baş yê salê hatîbû hilbijartin, bialbumaxwe ya duyem "Xewrevîn" de jî dirêya muzîka kurdî de biaramîdimeş dikarê bêpeydakirin.



## Di navbera Kar û çalakî yê yekîtiya xwendevan û ciwanên demoqrati kurdistanî - rojava. De



### DIJWAR TEWFÎQ-AMÛDÊ

Li bajarê AMÛDÊ roja ÎNÊ rêkeftî 2013\9\27 semîna rek hat li darxistin ji aliyê leqê amûdê û rojavayê qamişlo ,û bi amadebûna hejmarek ji xwendevanên zanîngehan. Û Destpêkir bi rawestan li ser giyanê pakrewanên Kurdistanê û li ser giyanê Barzaniyê nemir, û tê de endamê desteya sikirtariyê DIJWAR TEWFÎQ axivî li ser damezrandina yekîtiya xwendevan û ciwanan divê rewşa awarte û taybet ku rojavayê kurdistanê tê de derbas dibe ,û her weha rola wan di hemû guhertinên ku li cihanê çê dibin, û berpîrsê leqê Mezlûm Qerno dest bi şîrovekirina pênasîn û armancên yekîtiyê kir ,û tekez kir ku ev yekîti rêxistineke kurdistanî ye ,û her weha Canda beşar û Şivan hecî gotin :emê xizmeta xwendevan û ciwanan bikin yê ku li ser xaka kurdistanê dijîn, û hêja ye gotinê ku xwendevanên amadebûne kêf xweşya xwe anîn ziman û gotin emê kar û xebata xwe bikin di bin peyrew û pirogramê yekîtiyê , Û di heman demê de wek BARZANIYÊ nemir dibêje: "XWENDEKAR SERÊ RIMÊNE DI HEMÛ ŞOREŞÛ RAPERÎNA DE"